TU BI XÊR HATIYÎ KITÊBXANEYÊ

Kurmanji

Destûra her kesî heye ku were kitêbxaneyê.

Hatina kitêbxaneyê belaş e.

Bi karta kitêbxaneyê tu dikarî kitêban deyn bikî û komputer û înternetê bi kar bînî.

Her kes dikare karta kitêbxaneyê bistîne.

Kitêb û rojname yên bi zimanên cuda û ji hemû cîhanê li kitêbxaneyê hene.

Wan li kitêbxaneyê bixwîne yan bi deyn bibe malê. Ew belaş e.

Fîlm, lîstik û sêlik hene.

Li kitêbxaneyê tu dikarî komputer û înternetê bi kar bînî. WiFi-ya belaş heye.

Li kitêbxaneyê tu dikarî tiştan çap bikî, kopiye bikî û skaner bikî.

Kitêbên zarokan yên bi zimanên cuda hene.

Ode ji bo deynkirinê hene.

Kitêbxane bi piranî bêdeng e. Dibe ku tu bîstikekê li vir rûnî.

TU WEHA KARTA KITÊBXANEYÊ DISTÎNÎ

1. Were kitêbxaneyê û li gel karmendan biaxive.
2. Nasnameya xwe nîşan bide. Heger nasnameya te tune be jî, tu dikarî karta kitêbxaneyê bistînî. Hingê ew kart ji bo sê mehan e.
3. Şîfreyeka pin-ê (çar reqem) bibijêre.

Karta xwe ya kitêbxaneyê bi xwe re bîne gava tu serdana kitêbxaneyê dikî.

Tu dikarî tiştê ku tu ji kitêbxaneyê deyn dikî yek, du yan çar hefteyan li bal xwe bihêlî. Tu dikarî gelek tiştan ji wan cardî deyn bikî.

Giring e ku tu wî tiştî yê ku tu deyn dikî di wext de vegerînî. Bervajî wê, dibe ku divê tu heqekî bidî. Karta te ya kitêbxaneyê jî dikare bê îptal kirin.

Tu wesilekê/meqbûzekê werdigirî gava tu tiştekî deyn dikî. Tê de tê nivîsîn ka tu herî dereng di kîjan tarîxê de tiştê ku te deyn kiriye vegerînî.

Em yên ku li kitêbxaneyê kar dikin bi kêfxweşî bersiva pirsan didin.

Kitêbxaneyên me xwedî malperek e ku navê wê ev e Minabibliotek.se. Piraniya tiştên ku tê de hatine nivîsîn bi zimanê swêdî ne.

Tu dikarî ji bo cardî-deynkirina tiştên ku te birine malê, sparişkirina kitêban yan deynkirina kitêbên elektronîk hesabekê di Minabibliotek.se de vekî. Em bi kêfxweşî alîkariyê dikin heger tu bixwazî.

KARTA KITÊBXANEYÊ BI KÊRÎ VAN KITÊBXANEYAN TÊ

BJURHOLM
Kitêbxaneya Bjurholmê

NORDMALING
Kitêbxaneya Nordmalingê
Stasiyona kitêban ya Rundvikê

ROBERTSFORS
Kitêbxaneya Bygdeåyê
Kitêbxaneya Robertsforsê
Kitêbxaneya Ånäsetê

UMEÅ
Otobusa kitêban
Kitêbxaneya Ersbodayê
Kitêbxaneya Grubbeyê
Kitêbxaneya Holmsundê
Kitêbxaneya Hörneforsê
Kitêbxaneya Mariehemê
Kitêbxaneya Obbolayê
Kitêbxaneya Sävarê
Kitêbxaneya bajarê Umeåyê
Kitêbxaneya Tegê
Kitêbxaneya Umedalenê
Kitêbxaneya Ålidhemê

VINDELN
Kitêbxaneya Vindelnê
Kitêbxaneya Granöyê
Kitêbxaneya Hällnäsê
Kitêbxaneya Tvärålundê
Kitêbxaneya Åmseleyê

VÄNNÄS
Kitêbxaneya Vännäsê
Kitêbxaneya Vännäsbyê

Kitêbxaneya herî nêzîk ji bo min: